 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

 *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

# Tîrêjên Çarşembê

**Xelek - 52**

## Gelo Pêximber Îbrahîm Hûrî bû?

**(beşê pêncem)**

**Hin Serinc û hin Pirs**

Piştî ku me agahdariyên derbarê pêximber *Îbrahîm* di Tewrat, Încîl, Qur'an û pirtûkên şîrovekirina Qur'anê da anîn pêş çavan, em niha van serinc û pirsên jêrîn dikin:

**Serinca yekem**: Di Tewratê da hatiye ku malbata *Îbrahîm* ji "*Ûra Keldanan*" koç kiriye û çûye "*Haran (Ĥeřanê)*". Gelo çima bêjerê tewratî "*Ûr*" daye ser "*Keldanan*". Gelo ev nayê wê maneyê ku li rojavayê Asiya kevin bêhtirî bajarekî bi navê "*Ûr*" hebûye? Gelo malbata *Îbrahîm* ji "*Ûr*"-a sûmerî koç kiriye û di pey ra jêra gotine "*Ûra Keldanan*", yan jî ji bajarekî din koç kiriye ku navê wî jî "*Ûr*" bûye?

**Serinca duwem**: Bêjerê tewratî gotiye malbata *Îbrahîm* û negotiye êla *Îbrahîm* ji "*Ûra Keldanan*" koç kiriye "*Ĥaranê*". Dîsa di Tewratê da hatiye ku dema Xweda ferman daye *Îbrahîm* ji "*Ĥeranê*" koç bike û here erdê Ken'an (Îsraîl / paşê Filestîn), jêra gotiye: "**Ji erdê xwe, ji êla xwe û ji mala bavê xwe here wî erdê ku ez şabî te didim**"[1]. Dîsa di Tewratê da hatiye ku *Îbrahîm* pêş mirina xwe ji serekê koleyên xwe ra gotiye ku bila kurê wî *Isĥaq* ji keçên Ken'aniyan şûnebe (nezewice); jêra gotiye: "**Here erdê min û here nav êla min, here û jinekê ji kurê min Îsĥaq ra bîne**"[2]. Serekê koleyan çûye "*Ĥeřanê"* û ji wir jinek ji *Îsĥaq* ra aniye. Gelo malbata *Îbrahîm* di bingehê da ji bajarê "*Ûr*" bûye yan ji "*Ĥeřanê*" bûye?

**Serinca sêhem**: Agahdariyên derbarê şoreşa *Îbrahîm* li dijî ayîna gelê xwe, şikandina wî ya pûtan, sezayê wî bi sohtandinê û derketina wî bi saxî ji nava agir di Tewratê da nehatiye; ev bi şêweyekî berfireh di "*Telmûd*" da hatiye; "*Telmûd*" pirtûka rêbaza devkî ye ku mezinên oldarên Cihûyan ji nifşekî gihandine nifşê din; ew di radeyê da piştî "*Telmûd*" tê. Gelo ev nayê wê maneyê ku ev agahdarî paşê, di sedsalên piştî heyma wî ra, avêtine ser jînenîgariya *Îbrahîm*, û dibe ku ew ji ber xwe afirandibin?.

**Serinca çarem**: Ne di Tewratê da, ne di Telmûdê da, ne di Încîlê da û ne jî di Qur'anê da nehatiye ku *Îbrahîm* Hûrî bûye yan Kurd bûye. Tenha di pirtûkên şîrovekirina Qur'anê da hatiye ku kesê pêşniyaz kiriye sezayê *Îbrahîm* sohtandin be kesekî Kurd bûye. Gelo şîrovekaran ev agahdarî ji kû wergirtine? Û heya kîjan radreyê ewê rast bin?

**Serinca pêncem**: Tiştê bi fêş û pir balkêş ewe ku ev kesê Kurd di paytextê padîşah Nemrûd da pir dihate guhdarkirin, heya radeyekê ku hema dema ji Nemrûd û gelê wî ra destnîşan kiriye bila sezayê *Îbrahîm* sohtandina bi agir be, hema gotina wî pejirandine.

Mirovekî ku gotina wî bê guhdarkirin li ba gelê padîşahekî ku ji wan biyanî ye tiştekî pir bi elawete. Gelo rastî çi ye? Gelo ewê Kurd mirovekî biyanî bûye, yan kesekî ji wan bûye?

**Serinca şeşem**: Di gotûbêjan da, li ser cihê ku bûyera sohtandin lê pêkhatiye, cudahî heye. Hin şîrovekaran gotiye ku ev şar bajarê "*Kûtê*" bûye. Ev bajarekî kevine û di welatê Sûmer da ye (başûrê Îraqê). Di Tewratê da hatiye ku malbata *Îbrahîm* li "*Ûra Keldanan*" dijiya. Gelo ev bûyer li "*Kûtê*" pêkhatiye yan li "*Ûra Keldanan*"?

**Serinca heftem**: Hin dîroknasan texmîn kiriye ku dema pêximber *Îbrahîm* têda jiyaye ye di navbera salên (1900 - 1700 b.z.) bûye. Hin bêjeran gotiye ku bûyera sohtandina *Îbrahîm* di heyama padîşah *Nemrûd* da pêkhatiye. Di Tewratê da hatiye ku bajarê Babil (nîveka Îreaqê) nawenda padîşahiya *Nemrûd* bûye û ku ew li ser welatê Akkad û Sûmer (başûrê Îraqê) desthilatdar bûye[3].

Di hin jêderan da hatiye ku ji bajarekî bi navê "*Kalah*" (*Kalxû*) ra digotin "bajarê Nemrûd" û jêra "Nemrûd" jî dihate gotin. Ev bajar bi 35 km li başûr-rojhilatê Mûsilê dikeve. Ev bajar ji aliyê padîşahê aşûrî *Şelmaneserê Yekem* da (1274 - 1245 b.z. hate avakirin[4]. Çiyayek jî bi navê "*Nemrûd*" heye, li parêzgeha Semsûrê (Adiyaman) li bakurê Kurdistanê dikeve. Gelo paytextê padîşah *Nemrûd* li kû derê dikeve?

**Serinca heyştem**: Di Tewratê da navê gelekî bi navê "*beno Kûş*" (*kurên Kûş*) hatiye, û ku "*Nemrûd kurê Kûş*" bûye. Heger em bînin bîra xwe ku şaxekî mezin ji pêşiyên Kurdan jêra "*Kaşşû, Kaşşî, Kasî, Kasît*" digotin [ku Kurdên Lor vedigerin ser wan] û ku ew li herêma ji Karmanşahê da li rojhilat heya bi kenarên rojhilat yên çemê Dijle dirêj dibe rûniştibûn û ku wan pir herêmên Îraqê li dor sala 1741-an b.z. xistibûn bin desthilatdariya xwe, û di pey ra li Îraqê bi giştî di navbera (1590 - 1159 b.z.) serdarî kirine, yanê li dora çar sedsal û çarîkek desthilatdar bûne, hîngê pirs ewe gelo peywendiyek di navbera gelê *Nemrûd*, *Îbrahîm* û *Kaşşiyan* da heye?

**Serinca nehem**: Di hin gotûbêjan da hatiye ku ew kesê pêşniyaz kiriye mencenîqê bikar bînin û *Îbrahîm* pê bavêjin nava agir kesekî Kurd bûye. Di gotûbêjeka din da hatiye ku wî mencenîq durist kiriye. Helbet, nayê veşartin ku duristkarê mencenîqê hewcedarê serboriyeka zanistî û endazyarî pêşketî ye. Bi me ra derbas bû ku hin şîrovekarên Qur'anê ew Kurd vegerandine ser revendên welatê Faris, yanê ewên ku di warê şaristanî da paşdemayî ne. Emê çawa bikin ku ev dijberî bi hev ra biguncin? Bi me ra derbas bû ku Hûrî di duristkirina çekan da pir şehreza bûn, wek erebeyên şer û mencenîqê. Gelo ew Kurdê ku qala wî dikin Hûrî bû?

Ev komek ji pirsan bûn. Emê lêbikolin û hewlbidin ku bersivan ji van pirsan ra bibînin.

Çarşemb, 23.03.2016

## Jêder

[1] Rêwîtiya pêkhatinê, eshah 12, ayet 1-2.
[2] Rêwîtiya pêkhatinê, eshah 24, ayet 2-4.
[3] Rêwîtiya pêkhatinê, eshah 10, ayet 10.
[4] Arnold Tuynbee, Dîroka mirovatiyê, 1/166. Sayid Al Qimni: Pêximber Îbrahîm, rûpel 38. Mohamad Bayyumi Mahran, Dîroka Ereban ya kevin, 1/352.